EHMED HUSEYNÎ : OCALANOS ! SER WEZNA SPARTAKOS ??..

Hevnasîna pê re ji pêrgîbûna çerxê keys wergirtiye, bi dengekî hûr û zelal tijî heskirin ,dengê E.Huseynî ji guhdaroka têlê min guhdar kir.Axaftina me mijûlî rewşa nivîskarê rêzdar Selim Berakat bû, yê ku weke min di girava Qibrisê ,,keça Afrodîtî,, dije .Bo warekî li gor bejna wî ya payebilind bibînin deku koçberî wira bike .Ji welatê berfê(Swêd) bo nişteçî bibe pak û rindtir nebû çimkî navenda kurdan ya herî bi çalak di warê ziman û wêje yê de û soz da pirtûkên xwe ji min re rêke ,li vira diyaloga me qedya.Û bi rastî jî, li gor soza xwe derket, herdu pirtûkên xwe ji helbestan,,Rono û sirûdên bêrîkirnê,, û ,,Bi xewna we pênûsê dilorînim,,bo min re rêkir.

Drama ku li ser sîmayê rû û henasên E.Huseynî yên çikyayî, nalîna bê heqiyê mor kir ye.Xedirbûn û xefleta çerxê bi xaka wî re ku ew ji milê wê çêbûye û rojbîn da yê, hişt li pey rîtma peyvan bikeve.Û têklidana wan peyvan bi wê êşa sitimkariyê hevîr bike ,deku derbirînên xwe bi pozberî bo zefkirina zimanê nîv hûndayî bike û nîgariya xwe bi zimanê Dê bi şêweyekî nûjen biafirîne. Bi peqîna peyvên nû,ji peyva rehgeh(masdar)û afirandina wateyekî nû jêre bi rengekî qeşeng têde xweş avjînî dike .Û ev weke nûderhînana wî ye di nûjen kirina helbesta kurdî de ku baskên wê gihandiyê qonaxekê di asta zimanê gelên din û vaya jêre di rûpela hişyariya me de ya çandî dimîne û bimîne.

Mirov li wêneya E.Huseynî temaşe bike, hest dibe ku di eynî çaxê de,dikene û digrî ,car caran di bernama xwe de,,dengvedana peyvê ,,di Roj TV de,fedyokî weke zarokekî ku dixwaze destûrê bistîne bo axaftinê.Drama wî ne bes bû, kedera dûrketina welat jî lê kom bû.Bi derengî ket nava lapê bê dengiya bendemayînê û diyare ji her kes re zehmetiyên bi temen derengî bikeve deryaya hûndakirinê . Û dûrkeve ji qûrmê dara tûyê,ji nîsk,ji bêhna şimamok û satîra Amûdê ku pê nav dare.Veqetîn serê xwe hildigêve û axînê di gyanê wî de dikole..ji ber reha jînê li ba helbestvan xaka wî ye.Rewşek pir tehlûke ye weke her tak ji me li vê bêdengiyê ku em têde dijîn.Di Pirtûka ,,Bi xwena we pênûsê dilorînim,, de,li ser dûrbûn di helbesta ,,Dûrî ,,de ,rûpela 115 an de wisa dinivîsîne: Biyanî av e

Axîna te derya ye
Kolana şerpeze
Ez ê vê car e
Xwe bavêjim sîtava te
Mîna lehiya kor….
Nehişî ,
Weke leşkerê bêgor ..

Li jêre hin texmînin xwe pêşkêşî xwênerê rêzdar bikim ser qurbaniyên wî bo pêlava Ocalanos ku bawerim birêz Ocalan bi xwe vî tiştî ew ê red bike çimkî bêhna kesayetiyek kole nîşan dike, li gor pir ragihandin û nivîsên wî,ku tim digot şorêşa me mirovê azad diafirîne.Evaya ger ji dil û can hevoka xwe hêja E.Huseynî gotibe.Ka em bi ber texmîna didwan de ,herin.

Bi hevoka dawî ji qurbaniyên diyarkirî,diyare Ehmed Huseynî hewl da xwe,nerîn û mereqên salan ku hilgirtibû ser henas û cegera xwe, jibîr bike.Bi pêla çemê re biherike û peyvekê sîmiyolojî(Ocalanos)bi karbîne û qurbanî pêşkêşî pêlava wî bike.Hewl da xwe jibîr bike ew kî ye,û ji wî dengê ku di kûrahiya havil de,yê nişteçî bûbû veqete.Tendûtûjiya di gyanê wî de,ji pirsan,gumanan serê wî pelixand û ancam wisa dertê ku andamên laşê xwe di mazadê de bo Ocalanos ser wezna Spartakos raxîne. Weke helwestekê veşartî ji fişarên ku bi ser de tên.Spartakos rêberê yekemîn şoreş di hişmendiya mirovatiyê de ,ku li dijî desthilatdariya Roman raperîn kir bû .Xûlam bû û şoreşa wî bi navê şoreşa xûlaman ya sisyan deng veda,lê bê serkeftin ser rûpela dîrokê bi mirina wî ew şoreş têkçû.Û weke helbestvanê me di afiradinên xwe de dihêle xwêner li wateya veşartî li pey rîtma peyvan bigere ,Gelo mebesta Ehmed ji peyva Ocalanos ev e !pirs dikim?!!. Ku,hemû xewn,hêvî,raman û ked ketin bin pêlava ocalan ji ber şoreşa wî bi ser neketiye ?.
Gelo ev kiryara wî ,dînîtî ya ji meznahiyê nîşan dide? bersivan ji dem ê re dihêlim.
Niha du kezebên çav li rê mane daliqandî,ya xwênerên E.Huseynî û ya keysperestan ku bi hêvîya ew ji holê rabe. Ta hin gotin ku ew weke helbestvan gora xwe bi destê xwe koland û pirsa min jê ev e, gelo gunhê wî bi kê bê? bi xwêner,an bi keysperestan an jî, bi wêjeya talan kirî hey çemê birîndar!...tu stran e,strana bîranîna westyayî ye.
Pirs ji nivîskarê Barazîlî Corc Amado Çima dinivîsîne kirbûn ?.Bersiv da:Ez dinivîsînim bo yê dîtir min bixwînin û bandor li wan bikim ,karibim bejdariya guhertina di rewşa welatê xwe de bibim.Mahmûd Derwîş helbestvanê Filistînê dibêje:
Ez dinivîsînim çimkî ez bê nasname,bê evîn û bê welatim.Gelo E. Huseynî paş qurbaniyên xwe çi bersiv ji pirsa çima dinvîsîne karê bide ?, ger ji dil hevokê got be weke min li jor destnîşan kir ye .Qudsîyeta kesan ,kî bin bela bibin tehlûka herî mezine di pêşeroja me de,çi bo Ocalan û çi bo Barzanî û Talabanî be .
Evîn,tirs,xemgînî,bê hêvî peyvên jiyana me ne tim bi mirov re paralêl in û li ser her kes derbas dibin. Ger bê hêvî mirov dagir bike ew ê wî birûxîne weke Mûşê Deyan ku cenêralekî Îsraelî yê, di şerê bi Ereban re bi serket bû sala 1967 de got bû : Ne ez û ne tu cenêralekî dîtir karê zora filistîniyan

bibe,yê ku zora wan bibe bê hêvî ye.Dibe kiryara helbestvanê me, ji bê hêvî be,wê çaxê kî hêvî bide xwênerê hêja Ehmed,ku tekoşîna te dişopnand bo wêjebûna helbestê, li vira gotina *Gandî hate bîra min ku di pirtûka xwe de ,,baweriya min bi aşitî yê,,dibêje : Yasaya heskirinê bi hêztirê ji yasaya rûxandinê ,bawerim heskirin û rûmeta E. Huseynî ji wêje re bi giştî û bi taybetî ji nivîsa helbestê bilindtir û bi hêztire ji rûxandina wê an wê têxe bin pêlavan de.

Rojnemevan B.Têlo
5.12.09

***Spartakos- xûlam bû ,şoreşa xûlaman li dijî Roman di sala 71 b.î bi rêvebir** .
* **Gandî -Mahatma Gandhi 1869-1948 bi wateya(havilê gewre) bi Sanskritî an Babo bi wateya (bavê netewî) bi Gujaratî . Hîdistanê serxwbûna xwe bi xêra rêbertî û ramyara wî ya bê lêdantûjî (bê şidet) bi destxist ye .**